



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 27

Çima Sûmerî ji pêşiyên Kurdan têne hejmartin?

Gelên rojavayê Asiyayê yên kevin û ji warê erdnîgarî va ji Mêzopotamiya va nêzîkin evin: Kildan, Suryan, Aşûrî, Ereb, Kurd, Faris û Ermen. Gelo me çima Sûmerî xistin nav pêşiyên Kurdan û ne gelekî din ji van gelan?. Ma gelo ne gengaz û mimkine ku Sûmerî ji pêşiyên gelekî ji van gelên din bin?

Armanca me bi ti awayî ne ewe ku em dîrokê biguhêrin yan tezwîr bikin; em li rastiye digerin. Me li ser bingeha belgeyên dîrokî û zimanî Sûmerî xistin nav pêşiyên gelê Kurd; ew belge jî evin:

Belgeyên dîrokî:

Yekem - Dîrokzanên mezin yên bi nav û deng piştrast dikin ku Sûmerî ne ji biyabana erebî (landik û dergûşa pêşiyên Samiyan) hatine başûrê Mêzopotamiya, lê belê, ew ji çiyayên Zagros (landik û dergûşa pêşiyên Kurdan) hatine. Mebesta wan ewe ku ji çiyayên başûrê Kurdistanê hatine, ew herêma ku deştên Mêzopotamiyayê ji aliyê rojhilat û bakur va hembêz dike (*li lêkolîna me ya derbasbûyê temaşe bikin*).

Duwm - Dîrokzanên mezin piştrast dikin ku Sûmerî bi ti awayî ji Samiyan, ne di warê nijadî û ne jî di warê zimanî da peyda bûne. Ev tê wê maneyê ku Sûmerî bi ti awayî ji pêşiyên Kildan (Babilî), Suryan, Aşûrî û Ereban nayên hejmartin.

Sêhem - Dîrokzanê amerîkî yê bi nav û deng *William James Durant* piştî ku derbarê Ariyanan û hin taybetmendiyên wan yên zimanî diaxife, dibêje: "**Kurtahiya van gotinan ewe ku Mîttanî, Hittî, Kassî (Kaşî), Sûmerî, Bakterî (Xurasanî), Mîdî, Faris û Ariyanên ku welatê Hind standin, ev hemû ji şaxên hindo-ewropî ne, ji kenarên Derya Hezar (Derya Xezer) li ser rûyê zemînê belav bûne**"¹. Ji van peyvên gelek aşkera ye ku birêz *Durant* Sûmeran di nav gelên ariyanî da dihejmêre û ne di nav gelên samî da.

Çarem - Birêz *Laurence Austine Waddell*, erdnîgarînas, zaniyarê arkêlojiyê û pisporê lêkolînên sûmerî û sansekritî ku berhemên wî di van waran da hene; li pir cihan di pirtûka xwe da "**Rahên sûmerî di şaristaniya misirî da**" dibêje ku senseleta padîşahî sûmerî ya yekem senseleteka ariyanî bû; ew Sûmeriyên pêşîn bi navê "Ariyanên pêşîn" bi navdike².

Pêncem - Lêkolîner *Îbrahîm El Fennî* dibêje: "**Sûmerî ji pêlên pêşîn bûn yê ku ji bakurê Îraqê (herêmên çiyayî) hatin û derbas Mêzopotamiyayê bûn, ji gelên ariyanî bûn**"³.

Belgeyên zimanî:


Dema ku *Laurence Austine Waddell* zimanê sûmerî û zimanê misirî yê kevin dide ber hev, dibêje ku dora 600 peyv ji rahên zimanê sûmerî di zimanê misirî yê kevin da hene, û herwisa di zimanên malbata ariyanî da jî hene. Deng û maneya van peyvên wekhevî, herwusa giyana maneyê wan jî⁴.

Tiştê girîng ji vê agahdariyê, ji bo me, ewe ku rahên peyvên sûmerî di malbata zimanên ariyanî da hene. Helbet tê zanîn ku zimanê kurdî zimanekê ji zimanên malbata ariyanî. Di jêderên dîroka Sûmeran da, tenha hin peyvên ku bi ber çavên me ketin, me dît ku ew peyv di zimanê sûmerî û zimaê kurdî da li hev diçin (dişibihin hev). Divêt em hesabê wê yekê bikin ku em ji zaravayên kurdî tenha bi zaravayê kurmançî diaxivim. Em bawer dikin ku birayên me yê bi zaravayên din diaxivin, bi taybetî jî birayên me yê Lor - Feylî ewê ducar û sêcar ji me bêhtir peyvên ku li hev diçin nasbikin; ji ber ku ew di warê erdnîgarî û zimanî da jî Sûmeran hên nêzîktirin.

Va ye li jêr bi kurtahî hin peyvên ku di navbera sûmerî û kurdî da li hev diçin. Emê peyvên kurdî li gor bilêvkirin û vekîta zimanê inglîzî binivîsîn, daku kesên ne Kurd jî bilêvkirina wan nasbikin.

- **Abzu:** Di mîtologiya sûmerî da tê maneya "ava ji bin erdê". Bi kurdî "Abzai, Avzai" (Avzê), yanê ava ku ji bin erdê têdize.
- **Agû:** Gerîndeyê (mudîrê) duristkirina sepetan û tiştên din. Yanê serwerê kargehê. Bi kurdî "ağa", yanê serwer.
- **Akitu /Akiti:** Cejna sersalê. Vê cejnê di serê nîsanê da destpêdikir û 11 rojan berdewam dikir. Babiliyan, û Kildan jî di nav wan da, û herwisa Aşûriyan ev cejin xistin nav ayîna xwe. Li hember vê peyvê gotinên "yak, yakiti" (yek, yekîti) hene. *Serinca wergêr: Hin Kurd peyva "yek" bi awayê "êk" dibêjin (nimûne: Kurdên herêma Hekarî) û peyva "yekîti" bi awayê "êkîti" dibêjin.*
- **A-saru:** Bi sûmerî tê maneya "serwer", yan jî xwedayê ku bi navê kurê rojê tê binavkirin. Li hember wê di kurdî da peyva "saro, sarok" (sero, serok) heye.
- **Ekall:** Bi sûmerî tê maneya "qesir". Ew bi şêwazê "Hai- kal" hatiye. Ken'aniyan bi awayê "Hekallu" birine û bi awayê "Heykel" ketiye zimanê erebî. Ev peyv ji perestgehên mezin ra dihate gotin. Bingeha wê "ê- gal"e, û tê maneya "xaniyê mezin". Di kurdî da li hember wê peyva "ai gal" (ê gel) heye, yanê tiştê ku xweserî gel bi giştî ye.
- **E-nmer-kar:** Navê qehremanekî sûmerî ye. Ew serdarê dewlet-bajarê Êrûk bû. Li hember vê peyvê di kurdî da peyva "ai nemir kar" (ê nemir kar) heye. Yanê ewê ku karê wî hemdeme û namire.
- **Baru:** Têgîneka ayîni ye û bi sûmerî tê maneya "zanayê diwarojar". Li hember wê di kurdî da peyva "pîr" tê gotin. Ev ji radeyên ayîni yê ayîna yezdanî ya kevin hatiye. *Serinca wergêr: Peyva "pîr" ya kurdî di zimanê inglîzî da bi awayê "peer" tê gotin.*
- **Gipar:** Bi sûmerî tê maneya beşekî ji perestgehê ku taybetî oldaran bû. Di kurdî da peyva "gi par" (cihê par, cîyê pişt) li hember wê tê gotin.
- **Mush:** Bi sûmerî tê maneya "maish" (mêş), (bi erebî "zubab").
- **Nenda:** Bi sûmerî tê maneya kesê ku xurek dide) ، تعني بالسومرية (طعام). Bi kurdî "nan" her nane û "nanda" bi kurdî tê maneya ew kesê ku "nan dide".

- **Kur:** Bi sūmerî tê maneya "cîhana jêrîn" yan jî "cîhana miriyan". Di kurdî da peyva "kûr, kwîr" tê maneya cihê kûr.
- **Lu:** Bi sūmerî tê maneya "mêr, mirov". Kurd dema gazî kesekî mêr dikin dibêjin: Lo. Peyva "law" jî di kurdî da tê maneya "kuř".
- **Lu- gal:** Bi sūmerî tê maneya "serdar, hukimdar" yan jî mezinê malbatê. Ev bi şeweyekî berfireh hatiye bikaranîn û ji xwedayê serek yê dewlet û civakê ra hatiye gotin. Peyva "Law gal" (lawê gel) bi kurdî tê maneya "lawê gel, kurê gel".
- **Ra:** Bi sūmerî tê maneya "roj, ronak, xwedayê rojê". Peyva "ro, roj" bi kurdî her diyare.
- **She:** yanê "ceh". Bi kurdî "cah" (ceh, cihe).
- **Zaqratu:** Ev bi sūmerî ji perestgehê ra dihate gotin. Perestgeh di bingehê da ji sê qoran pêkdihat. Di kurdî da tê maneya "sai qor" (sê qor), yanê avahiya ku ji sê qoran pêktê⁵.




شكل زاقورا سومرية

Dijderketin û şîrovekirin:

Başê, belkî kesek bêje, tamam, Sūmerî ji ariyanên pêşînin. Lê belê, gengaz û mimkine ku ew ji pêşiyên Faris û Ermenan bin. Ev jî mîna Kurdan ariyanî ne. Ma peyvên wek hev di zimanên farisî û ermenî da jî peyda dibin yan na?.

Em dibêjin: Belê, dibe ku peyvên li hev diçin di farisî û ermenî da jî hebin. Lê belê, tevî wê jî, Sūmerî ne ji pêşiyên Faris û Ermenanin. Ji ber ku Faris li dor nîveka sedsala 9-an b.z. gihîştine Ariyana (Îrana niha) û hin bi hin ber bi başûrê Îranê va hatine û dawî li herêma "Parsumash" bi cih û war bûne, û ji vê peyvê navê "Parsua" (Faris) hatiye⁶.



Welatê Faris li başûrê Îranê

Ermen jî di sedsala 8-an b.z. da gihîştine herêma Qefqasan, û herêma "Ûrartû" (Ermîniya niha) piştî sala 613-an dagîr kirine. Pêş hatina wan "Ûrartû" warê Xaldiyan bû. Xaldî jî neviyên Horiyanin⁷.



Lê belê pêşiyên Kurdan yê wêk "Gûtl, Lolo, Sûbarî) li çiyayên Zagros di dema Sûmeran da hebûn. Hebûna pêşiyên Kurdan wêk "Kaşşî" û "Hori" jî li wan herêman hebûn pêş hatina Faris û Ermenan bi bêhtir ji hezar salî. Divêt em bi ser da jî bêjin ku ne Faris û ne jî Ermen ji rûniştivanên bingehîn yê çiyayên başûrê Kurdistanê ne; ew herêmên ku di dema xwe da ji wir Sûmerî daketine başûrê Mêzopotamiya. Hîngê çawa wê Sûmerî ji pêşiyên wan bin?



Çarşemb, 30.09.2015

Jêder

¹ William James Durant: Dîroka şaristaniyê, 3/20, nîşe 2.

² Laurence Austine Waddell: Rahên Sûneran di şaristaniya misirî da, rûpel 236, 238.

³ Ibrahim El- Fenni: Tewrat, rûpel, 319.

⁴ Laurence Austine Waddell: Rahên Sûneran di şaristaniya misirî da, rûpel 264.

⁵ Me ev agahdarî ji pir jêderan wergeritine ku ne hewce ye bêne gotin.

⁶ Ebdulhamid Zayed: Rojhilata hemdem, rûpel 600. Ehmed Fekhri: Lêkolîn li dîroka rojhilat ya kevin, rûpel 210.

⁷ Willam Langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/89. Merwan El Mudewer: Ermen di nava dîrokê da, rûpel 106.